


Azad(i) û azad(i)ya me?

Mihemed ELÎ


efrin2612@hotmail.com

Ji sergotarê diyar e, ku mijara me girêdayî sedema ka çima dengê /i/, [i] li pêş /j/, [y] dibe /ə/, [i]?



Di destpêkê de girîng e xwendevanê hêja bizanibe, ku pêvajoya vê guhartina dengî bi nivîsandinê ve ne girêdayî ye, lê mijareke hilberîna dengî ye û girêdayî alavên hilberîna dangan e di pişik, qirik û zimên de. Di hemû zimanan de tu alêbayeke ku sedî sed dengên zimanan raber dikin tune ye, li lewre bilêvkirin tiştek e û nivîsandin tiştekî din e! W. m di Kurdî de /x/ hem ji bo [x],[xebat] û hem ji bo [χ] e [xeyal]. Li gorî nexşeya hilberîna dangan û cihê zimên di vê hilberîna de (Vowel Diagram), mirov dibîne ku /i/, [i] bi serê zimên tê hilberî û /ə/, [i] bi nivê zimên tê hilberî.

Pêvajoya axaftinê û hilberîna gotinan jixwe zincîreke dangan e, ango deng yeko-yeko nayên hilberîn, lê wek zincîrekê pevgerêdayî deng tên hilberîn. Li gorî phonology an jî bilêvkirinsaziya zimanan herdem dengê piştê an jî berê tê bandorê li dengê din dike, ev sedem e ku çima mirov hin caran /s/ a gelemari di Îgilîzî de



hin caran wek [s] û hin caran wek [z] bilêv dike. W.m eggs [egz] û hats [hats].


Li gorî zagotina bilêvkirinsaziya Kurdî jî du dengdêr nikarin li pey hev werin, bêyî ku dengê şemitûk wek /j/, [y] an jî /w/, [w] nekeve navbera wan. Bi Kurdî jî me jê re got „şemitûk“ ji ber ku ev yek wate û xwezaya yê dengî li gorî erk û navlêkirina IPA (International Phonetic Alphabet), (Alêfbaya navnetewî ya dangan) raber dike. Ji ber ku ev mijar hinekî fireh e û bêhtir girêdayî „phonetic“ dengsayî ye, me nexwest pêde biçin, lê bêhtir li ser mijara bilêvkirinsaziyê rawestin, nemaze li ser mijara çima /i/, [i] li pêş /j/, [y] dibe /ə/, [i]?

Bi rêya sepana (application/software) ya „Praat“ ku dangan tomar dike û pêkaniya dîtina şênber a danga berdest dike, me herdu dengên mijara vê gotarê ne tomar kirin û me xwest bi şêweyekî zanistî sedema guhartina wan şîrove bikin.

Di hemû zimanên cîhanê de dema dengê dawîn di gotinê de tê hilberîn, pişikên mirov derfetê distînin û henaseyekî dikişînin hem ji bo mirov pêdiviya xwe ji bayê/oksîjîn bistîne û ji ber bêhenaseyî (bênefesî) nemire û hem jî ji bo ev henase ji bo hilberîna dengê(n) din were terxankirin/bikaranîn. Ev taqî/tecrûbe jî, heke mirov hewl bide navbirê nexwe nav hilberîna gotinan û pêvajoya xweristî ya henisandê bibire, mirov dê yekser bibîne, ku ew nema dikare bihenise û reng e di encamê de bimire!

Sebarek bi dengên di nivê gotinan de tînin hilberîn rewş cuda ye, ango alavên hilberîna dangan (pişik, qirik û ziman) bizav dikin hemû dangan bi yekcar hilberînin û sûdê ji

bayê di pişkan de komkirî werbigirin. Di rewşeke wisa de alavên berpîrsên hilberîna dangan in, hewl didin xerckirina bayê parastî kurt û kêr bikin. Wek ku aşna ye (nas e) ku dengdêr bêhtir pêdiviya wan bi bayê heye dema ew tîl hilberîl, w.m a, e, î û o, bêhtir ba û dem ji wan re gerek e ji k, j, s, ş, t, d.



Di wêneya yekemîn de, li banî milê çepê, ku „Praat“ ji bo dengê [î] afirandiye, mirov dibîne ku dema hilberîna (0.280245) parik ji çirkeyekê ye, lê wêneya duwemîn, li banî milê rastê [i] dema hilberîna (0.109808) parik ji çirkeyekê ye. Ev dem yek sedem e, sedema duwemîn jî girêdayê zimên, ango kîjan cih ji ziman ji bo hilberîna kîjan dengî berpîrsiyar e.

Li gorî nexşeya hilberîna dangan û cihê zimên di hilberîna wan de (wêne .1, Vowel Diagram) xuya dike ku [î] bi serê ziman tîl hilberîl û dengê dawîn e di gotinê de (azad(i)), lê dengê [i] bi nivê zimên tîl afirandin û ne dengê dawîn e di gotinê de, ango dengê ku li pey wî were dê bandorê li dem û şeweyê afirandina wî bike (azad(i)ya). Di vê rewşê de jî dengê amajepêkirî dengê [y] ye. Ev deng wek dengê [î] bi serê ziman tîl hilberîl, lê taybetmendiyê xwe heye, ku yekser şûnve dişemite, ji ber wê me bi Kurdî jê re gotiye „şemitûk“ ku bixwe wateya navlêkirina navnetewî ya vî dengî dide „glide“.

Îca dema ev deng dikeve navbera [î] û dengdêrêkî din ve, [î] nema dengê dawîn di gotinê de ye û karê zimên di hilberîna gotinê de hêj neqediye berî ku raweste û pişik henaseyê kurt bikişîne. Di vir de ziman dengê berî [î] hildiberîne û di mînakê me de [azadî] ev deng [d] ye. Ev deng jî „alveolar stop“ e, ku dengdêrêkî bi serê zimên û paş feka banî tîl hilberîl. Li vir li gorî xweristiya tevgera ziman di dev de, dê ne pêkan bûya ku serê zimên du deng di heman demê de hilberandina, ango hem [d] û hem [î]. Ji ber vê yekê dema [î] li dawiyê tîl, serê zimên dengê yekemîn, di mînakê me de jî [d] hildiberîne û piştê dengê [î] hildiberîne bêyî ku xwe bilivîne, lê dema [y] dikeve navbera [î] û dengdêrêkî din, hem ziman û hem jî alavanên din yêl hilberîna dangan sûtê werdigirin û hewl didin di şemitandina zimên de dengêkî kurtir bafirînin. Li vir jî dengê [i] ye, ku wek [y] bi nivê ziman tekûz dibê (Mirov hest dike, ku ziman piştî hilberîna [d] bilez xwe şûnve dikişîne daku biçê dengê [y] hilberîne lê berî bigihîne [y] dengê [i] bilez û kurt hildiberîne, cudabûna dema hilberîna [î] û [û] li gorî ku „Praat“ nîşand daye jî vê dabaşê dipeyitîne).

Di vir de hêjayî amajepêkirinê ye ku piraniya dengên li pey [y] di Kurdî de tîl hilberîl bi paşya ziman an jî di wê rewşê de ne dema ziman nizm e, wek /e, a/ ku bi piranî di rewşa îdafeyê de tîl paşya [y]. Ev mînak jî baş xuya dike ku di Kurdî de deng bandorê li hilberîna hevûdin dikan. Êdî sedema guhertina [î] berî [y] bi [i] jî ev e.